söz konusu mu?“ şeklindeki soruya da Erdoğan, şöyle yanıt verdi: „İran'la bir gerginlik var diyemem. Ama Suriye konusunda kendilerine 'Sizden aldıkları cesaretle Esad yönetimi şımarıyor' uyarısını yaptık. Ahmedinejad'la telefonla bu hususu görüştük. Sonra özel temsilcisini gönderdi. Onunla da konuştuk. Tavırlarında değişiklik oldu. Yakında Hakan Bey'i göndereceğim. BM toplantısında da muhtemelen Ahmedinejad'la görüşeceğim. Daha sonra benim de gitme durumu olabilir.“

„PKK'ya karşı bir işbirliği nasıl gidiyor?“ şeklindeki tamamlayıcı soruya ise Erdoğan'ın cevabı kısa oldu: „İyi gidiyor. Kandil'de müşterek bir çalışma yapabiliriz.“

HABER MERKEZİ

Jîyan û bi serhata azadîkarê gelê kurd Gêneral Mistefa Barzanî

Piştî Silemaniyê, gunde Barzan dibe navenda xebata sîyasi li başûrê Kurdistanê:

Piştî şikesta şorişa Şex Mahmudê nemir barê xebat û karê Kurdayetiyê li başûrê Kurdistanê bi yekcarî dikeve here-



ma Behdînan ku navenda rêberatiya wê xebat û hereketa gundê biçuke Barzan e. Qeza Mêrqaşor ku nahiyên Mêeqaşor, Barzan û Şêrvan digire ber xwe, girêdayî wîlayeta Hewlêrê ye.

Devera Berzan beriya kû piştî çend serhildanên kurdan bi yekcarî ji aliye rêjîmên dagirker ve wêran bibe, 400 gundên awedan têda hebune û hejmara runîştvanan heremê zêdetir ji 40 hezar kesan buye. Herema Barzan û navenda wê gundê Barzan di çaxê Şêx Ebdulsalamê yekem da ku di sala 1872-ê zayînî de wefat kir, ji ber ku tekeya terîqeta Neqşbendî li Nehrîyê têda bu, mîna navendeke olî û awedan ku herdem tevî mirîdên ve terîqetê bu, tihat hesibandin. Şêx Ebdulsalamê yekemîn berêvajî şêx û axayên hemdemî xwe, mirovekî dadmend û bi edalet bu. Wek jêderên bîyanî didin xuyakirin di çaxê wî da hinek karên baş û xebatên sosyalî ji bo pêşketina jîyan û rewşa civakî hatin kirin ku ger bi pîvanên roja îro bîn nirxandin û şirovekirin, di wê serdemêde pir girîng bun. Ji wan karan: parvekirine zevî û erdê



çandinê bi ser gundiyan de, qedexekirina milkdariya zêde bi şeweyên fêodalî, qedexekirina bi zorê zûdayîna keçan û parastina siruşt Kurdistanê anku birina dar û dirextan, şewitandina daristana û qedexekirina kuştin teyr û tiwalan, neçira heyvanên kovî, bêhinfreyî li hemberî dîyanetên der û dora coxrafiya jîyana wan û herema Behdînan (Jîyana hevpar bi

Kurdên êzidî, turkmên, kildanî, yehudî, xaçparêzên ermeni ê musliman bun û ...) jîyana dostanî bi hemu gelên heremê re û xala herî girîng parastina mafê gelê kurd û serkeşiya bizava netewiya kurdan di heremek coxrafiya girînga Kurdistanê de ku nişana demokratîkbuna bîr û ramanên bireveberên Barzanî bû, tesîrek mezin li ser bizava sîyasi loliya wê malbatê danî.

Piştî wefata Şêx Ebdulsalamê yekem kurê wî Şêx Mihemed Barzanî dibe çîgirê wî. Şêx Mihemed piştî zewacê dibe xwe-duce pênc kuran: Şêx Ebdulsalam, Şêx Ehmed, Mistefa Barzanî, Mihemed Sîdik û Şêx Babo. Wan tevan ji desbêka xwe-nasandinê bu hemu awayan xebat kirin ku rîya kalkê xwe ya xizmeta ji bo gel di hemu warên sîyasi, olî û civakî de dibomîn.

Navdartinê endamê wê malbatê ku tevaya temenê xwe di rîya xebata sîyasiya jib o kurd û Kurdistanê derbas kir, Mistefa Barzanî ye.

Mistefa Barzanî kîye, çîkiriye û serhildana wî di dîroka Kurdistanê de xwedî rolekî çawaye?

... Jiyana te jî tijî buyer, derdîberî û niştîmanperwariya Mistefa Barzanî ye heja radeyeke. Bersîva van pirsên me bide.

Jiyane nemir Mistefa Barzanî, malbata wan û çend buyerên din di jîyana wî da.

Mistefa Barzanî di 14-ê adara sala 1903-an (14. 03. 1903) de le gundê Barzan hat dinê. Beriya ku ew cavên xwe bi jîyana dinyayê veke, bavê wî (Şêx Mihemed) ji di sala 1903-an de wefat kiribu.

Li gor çavkanîyên dîrokî her çend nerazîbun (itiraz) û bizava Şêx Ebdulsalam Barzanîyê duyemîn li dijî Osmanîyan zêde dewam nekir, clê ev serhildan û serhildanên din yê mîna serhildana eşîreta Millîyan bi serokatîya Îbrahîm Paşayê Millî û çend serhildanên din li heremên cuda bi cudayên Kurdistanê, bun sedemên xweşkirina zemînêya çêbuna şoreşa Îtîhadîyan di sala 1908-an de.

Çaxe çalakî û lêbatên sîyasiyan Barzanîyan vedigere bo destbêka sedsala XX-an ku bi serokatîya Şêx Ebdulsalamê duyemîn di sala 1907-an de bi qasî du mehan li heremê berde-wam bû. Piştî ku Osmanîyan serî h i l d a n t e k ş i k a n d i n gelek kes zindanî kirin ku Mistefayê 3 salî

jî yek ji wan bu ku bi dayika xwe ve di girtîgeha Musilê de hatin girtin. Mistefa Barzanî zu tema derdê duri û xema bindestiya gelê xwe ji sê saliya, dema ku hê zarok bu di nava lepên dujminê dagirker da kesand. Salek piştî di çaxê hêrişa êtîhadê de gundê Barzan ket ber hêrişa hêzên wan yê di bin serokatîya Silêman nezîf Paşa

da. Ji ruyê neçariya Şêx Ebdulsalam Barzanî pêna xwe bo Seyîd Tehayê Nehrî dibe û di gunde Rajan li herema Mirgever (wîlayeta Ûrmîyê - Rojhilatê Kurdistanê) dimîne û bi hevkarîya serokê Kurd nemir Simkoyê Şîkak bi karbidestên Rusan re dikeve nava peywendîyan sîyasi, lê mixabin çaxe ku ew li herema Mirgever bû, ji aliye xwefiroşekî bi navê (Sofî Ebdullah) ve bi şeweywk namerdane hat girtin û ew teslîmî dewlîwta Osmanîyan kirin. Osmanîyan di 14-ê çiraya paşîn sala 1914-an de piştî pekanîna dadgehek formaliê, Şêx Ebdulsalamê Barzanî li bajare Musilê darda kirin.


Di etmosfêrek wiha tijî kîna li hemberî dewletên dagirker û zordariya destgeh û berpirsyarên hokumeta Osmanî de, Mistefa Barzanî ji mîna Îsmail Axayê Şîkak, Şêx Mehmed Berzençî û gelek serokên din yê kurd çavên xwe bi jîyaneke tijî êş û elem vedike û di nava malbatek olî de mezin dibe. Ev rewşa jiyane pêşeroja jîyan û helwesta sîyasiya wî lîdêrê kurd ji dide destnîşan kirin û ew bîr û ramanên Kurdayetiyê bêtir di hest û mêjiyê xwe de dide perwerdekirin. Piştî ku Osmanîyan bi bêbextî Şêx Ebdulsalam Barzanî şehîd kirin, Şêx Ehmedê birayê wî bu rêber û serkarê herema Barzan û eşîretên Barzanî. Wê demê temenê Mistefa Barzanî 18 salî bu. Beriya wê li gor çavkanîyên dîrokî di navbera salên 1917-a, 18 û 19-an de, Şêx Ehmedê Barzanî birayê xwe yê xurt Mistefa Barzanîyê 16 salî bi Şêx Abdulrehmanê Şîrnexî rê jib o lidarxistina kar û barê şoreşek berfîreh li b a k u r ê K u r d i s t a n ê dişîne bajarê Muşê û ew li wir hev dîtîneke bi Şêx Abdulqadirê Nehrî û Şex Seîde Pîran re pêk tîne. Herwiha Şêx Ehmed bi şeweyek nihînî ji sala 1920-an û pêde bi Şêx Mehmedê Berzençî û



Simkoyê Şîkak re ku sergermî xebeta li dijî her du dewletên Îraq û Îranê bun, dikeve nava tekeliyên politik. Mistefa Barzanî ji çaxê li xwe famand, zû bi bindestî û tepeseriya gelê kurd hesiya. Wî dixwest bi hevkarîya birayê xwe Şêx Ehmed, xelekên zincîra hereketa kurdî bi rêk û peki bidomîne.

Herwiha Mistefa Barzanî ji temene 15 saliya xwe û pêde bo kar û barê parastina hoza Barzan li dijî desthilatdariya dewleta navendîya Îraqê û hozên çiran, roj bi roj wekw şervanekî zîrek erk û w e z î f e y ê n zêdetir li ser milên xwe hîss dikirin.

E ş î r e t ê n kurd bi giştî û eşîretên Barzan bi taybetî di t e v a y a d i r ê j a h î y a dîroka xebata sîyasiya xwe de bi wefadariyek mezin û di tengaviyên herî giran de rêbatên xwe bi tenê nehîştine û bi dilsozî û fedakarî ew parastnîne. Ev rasti di bîranînen wan serleşkêrên a r t ê ş a d e w l e t ê n dagirker de ku



bi hêzên Barzanîyan re ketine nava şerên giran ji, tê dîtin. Serleşker Teferuşyan, Hesên Erfeî û Rêzîm Axa di pirtukên xwe de wê rastîyê deslîmîn.

Dûmahî rûpêl. 8

Sala 1919-an Mistefa Barzanî li ser biryara birayê xwe Şêx Ehmedê Barzanî dema ku xortekî 19 salî bu weke ferman-darekî şervan û şareza, bi hêza xwe wê ji bo hevkarîya xebatkarên şoreşa Şêx mehmudê Berzinçî xwe gêhand herema Silêmaniyê. Hêza wî bû du qoli ku halîkarî ji qolla Pîyaw û koma din jî ji navçeya Balek de derbas bun. Ew herçend di rê de rastî şerê bi eşîretên hevkarên înglîzan re rast hatin jî, lê bi fidakariyêk mezin û şehîtbuna çend şervanên Kurd wan xwe gêhandin herema Silêmaniyê. Mixabin berî ku ew bigêhin wê derê şoreşa Şêx Mehmede Berzençî jî bi dilî ji Kurdistanê hat dur xistin. Mistefa Barzanî bi ve kiryara xwe da îspatkirin ku pêvîsta her kes bi şevyek netewî nêzî pîrsgireka gelê xwe bibe.

Kurdistanê (Mihabad 1946) de jî Melle Mistefa Barzanî sînorên destçerîkî bi fermî nas- nekirin û xwe gêhand paytexta komara bajarê Mihabadê. Ev nişanek ji bo selmandine ve



Barzanî wek rêberekî şareza li hemberî hêza dîjmin bi temamî hatibu eşkere kirin.

Lê şerê herî mezin ku nemir Mistefa Barzanî hertim di jiyana xwe de bi serbilindî û şanazî behs li şer kirîye, şerê bi navê (Dole Vajî an jî Dola Vajîya yê ku di rojên 3 û 4-ê 02). Şûbatê sala 1931-an de li Dola Vajîya li

Bihara sala 1932-an artêşa Îraqê bi hevkarî û piştgirîya hêza esmanî û leşkerîya dewleta kedxara Brîtanîya, hêrişek giran bir ser herêma Barzan. Gundê Barzan ku wek navendeke rêbaratiya şoreşa Kurdan dihat hesibandin, bi giranî hat bombabarankirin û her çend Barzanîyan bi mêranî

piştê jib bo Nasiryê, Kifrî û Pîrde (Alton Kopri) û di dawiyê de ji bo Silêmaniyê sirgun kirin.

Di dawîya bihara sala 1936-an Mistefa Barzanî jî bo gotubêjên dîplomatîk bo bajarê Musilê hat vexwîndin, lê berpîrsiyarên dewleta Îraqê li wur Barzanî girtin û bi kiryareke durî exlaqe mirovanatîyê walîyê

bun ji hêza serleşkerêkî şareza mîna Mistefa Barzanî û şervanên wî mifayê wergirin di 12.07 Ji sala 1943-an de orqanîzasyona nihiniya endam û sempatên partiya Hîwa, Mistefa Barzanî piştî 10 salan derbiderî û jiyana hêsiyê ya di destê karbi destên dewleta Îraqê de, ji bajarê Silêmaniyê bajarê Sînoyê li Rojhilatê Kurdistanê kirin. Di wan mercên nazîk û hassas de vegera Mistefa Barzanî ya ber bi Kurdistanê tirs û xofek mezin xiste dilê karbidestên herdu dewletan her yekî bi qasî 50.000 dînanan ji bo kuştin an jî anina serê Barzanî dan diyarkirin. Xuyaye ku ev hejmêra bilinda diravê ku ji bo serê Barzanî hatibu diyarkirin, giringîya xebat û bizava Kurdan ya di bin serokatîye Barzanî di wê demê de dide eşkere kirin.

Bi hezaran sal e ku kurd bona azadiyê şer tike

Lê Mistefa Barzanî piştî jiyana rewşa wan salên ku li durî Kurdistanê û di bin çavderîya berpîrsiyarên dewleta Îraqê de derbas kiribû, vê carê bi hurbunî xebiti ku hêzek leşkerî ya rêkubêk li dora xwe bicivîne. Ji bona wê jî di 28.07 Julaya sala

Jîyan û bi serhata azadîkarê gelê



rastîya dîrokî bu ku di navbera Kurdan de hevgirtinek bihêz pêkhatibu. Lê mixabin merc û rewşa siyasîya cîhanê, dîroka Kurdan ber bi rêyek din ya berovajî berjewendiyên Kurdan ajot.

Yekemîn serhildan û şoreşa Barzanî di roja 9-e Sibata sala 1931-an (09.02.1931) de bi beşdarbuna 80-ê şervanên Kurd di bin serokatîya Mistefa Barzanî de di şerê bi navê (Berqê Begê) li dijî artêşa Îraqê destbêkir. Di vî şerê ku piştê di domandina qedera siyasîya Kurden başurê Kurdistanê de rolekî girîng lîst, hêzên artêşa Îraqê bi giranî li hemberî şervanên kurd şikestê xwarin û xisarek canî û maddî ya zêde bi dewlwa Îraqê ket. Li hemberî şehîdbuna 5 peşmergeyên Kurd û birindarbuna hejmarek kêma ya şervanên kurd, artêşa dewleta Îraqê 126 kuştî û bi sedan birindar li pey xwe hiştibun.

Ev tê wê wateyê ku di çaxe serhildana sala 1931 û 1932-an de êdi tiwan û hêza Mistefa

hemberî artêşa dewleta Îraqê qewimî. Di şere Dola Vajîya de Mistefa Barzanî yê 28 salî bi wan şarezîyên ku li ser taktîkên şerê partizanî hebun, karî bi hewkarîya şervanên xwe 235 esker û ferman-darên artêşa dewleta Îraqê bikujin û bi sedan kes jî hêzên dewletê jî di vî şerî de birindar bun. Ev di helakî da bu ku ji şervanên Barzanî tene 12 kes hatibun şehîd kirin. Di vî şerî da jî ber wan hêriş û berwanîyan ku li gor zanist û taktîkn şer bênumune bun, stêrka şansê Mistefa Barzanî wek rêber û serleşkerê kû jê hatî roj bi roj geştir bu û wî karî di nava Kurden hemu Kurdistana mezin da hêzek menewî ya bilind biafirîne. Bona wî vî şerî ne tenê di nava Kurdan de belkî di nava medya dewletên cîran û cîhanî de ji dengekî bilind veda. Ji bona bêtir nasandina van calakîyên dîrokî li ser hereketên Barzanî pewîştîyêk girîng bi lêkolînên akadêmîk û zanistî heye.

berxwedan kirin û di destpêkê de hinek serkeftin bi dest xistin lê nikarin li hemberî hêza pîrcek û cebilxanê û firokên şer yê İngîlîzan, li berxwebidin. Piştî we buyerê Şêx Ehmed û malbatên Barzanîyan neçar man di havîna sala 1932-an de derbasî bakure Kurdistanê bibin. Lê bihara sala 1933-an dewleta Tirkîyê Şêx Ehmedê Barzanî ku wê demê rêberê siyasî û olîyê hereketê bû, bi çend şervanên wî jî Tirkîyê teslimî dewleta Îraqê kirin.

Ji vê tarîxê û pêde di dîroka serhildana Barzanîyan de rûpelê durketin û derbideriyê vedibe û jîyanek tîjî eş û buyer di nava Kurden başurê Kurdistanê de dest bêdike. Dema ku Mistefa Barzanî ev bêbextîya dewleta Tirkîyê dît, ji wir ber bi cîyayên Kurdistanê çu û xwe teslimî dewlwa Îraqê nekir. Lê li ser daxwaza Şêx Ehmed, Mistefa Barzanî jî xwe gihand cem birayê xwe (Şêx Ehmed) yê ku di girtîgeha bajarê Musilê de bu. Mistefa Barzanî herçend dizanî ku jîyanek tal û nexweş li benda wî ye lê ji ber tewazî û qanûnên malbatî, bi kêfxweşî jîyana girdîgehê ji xwe re hilbijart.

Sala 1932-an di çaxê jîyana hêsiyê û dilketîda Barzanîyan dê, dewleta Îraqê bi rênmûniya axayên xwe yê Brîtanî Şêx Ehmed, Mistefa Barzanî û malbatên Barzanîyan berê şandin bajarê Musilê û

Musilê ye wê çaxê xwest ku bi dayîna jehrê, wi ji holê rake, lê Mistefa Barzanî piştî du hefteyan ku ketibu hale bêhîşyê, ji mirinê rizgar bu.

axa bav û kalên xwe Kurdistanê dijîn. Kesên ku li ser erdnigariyêk bedew û rengin jîyanê derbas bikin, zu bi zu nikarin fêrî jîyana durî coxrafiya Kurdistanê jî bibin. Bi wateyek din jîyana durî cîya û newelên Kurdistanê jî bo Kurdan pir nexweş e û malbatên wan yê ji Kurdistanê hatin durxistin, li benda derfetek bicuk bun vegezin welatên xwe Kurdistanê.

Şerê cîhanê yê duyemîn Pîrsgireka Kurd u Doza Mistefa Barzanî:

Şerê cîhanê yê duyemîn derfetek girîng ji liv û xebata siyasîya kurden başur û rojhilatê Kurdistanê re afirand ku di warê ramyarê (politik) de ji bo netewa xwe karekî bikin.

Sala 1943-an partiya Hîwa bi



serokatîya nemir Refîq Hilmî xebatek nihînî û bi dîsplîn di bajarên Îraqê û Kurdistanê de didan meşandin. Berpîrsiyarên partiya Hîwa ji bo berfîhekîrîna kar û xebata xwe ya siyasî û leşkerî ku bikari-

1943-an de bi awayekî nihînî ji rojhilatê Kurdistanê vegezin cihwarê bav û kalên xwe Barzan û di demek kurd de karê zêdetir ji du hezar (2000) pêşmerge û şervanên mêrxas li dora xwe kombike. Bi vî rengî Mistefa Barzanî serhildana xwe ya duduyan di Julaya sala 1943-an de da destpêkirin û şoreşa Barzan ya duyemîn ji heya bihara sala 1945-an berdawam bu. Di vê serhildanê da ji Kurdan li hemberî hêzên dewleta Îraqê gelek serkeftin bi dest xistin.

Di çaxê şoreşa Barzan ya duyemîn de ji 2-ê Oktobra sala 1943-an heya 10-ê Novambra sala 1943-an diwartirin şerên bixwîn di navbera hêzên Kurd û hêzên dewleta Îraqê de qewimîn ku di

tevaya şerên çêbuyî de rejîma Îraqê rastî xisarek mezina maddî û mrovî bu û bi hezaran leşkeran wan canê xwe ji dest dan.

Dûmahî rûpel. 9

Di dîroka azdîxwazîya gelê kurd ya li Başûrê Kurdistanê şerên şoreşa Barzan ya duyemîn an ku şerên Şaneder, Xêrîzok, Gurûtû, Mezinê û şere Meydana Morîkê cîhekî girîng digirin ber xwe. Êdî ji wê şoreşa duyemîn û pêda mora netewayîti bunê bêtir zêdetir ruyê xwe di hereke Barzanîyan de daxuyakirin û partîya Hîwa û hemu efsêr û serleşkerên Kurd ku di nava artêşa Îraqe de mijulî xizmete bun bi rihek niştimanperwerî piştgirîya vê serhildan û bizava netewî kirin. Xisara mali û canî ya ku dewleta Îraqe li hemberî şervanên Kurd tuş bibu ew neçarkirin ku di 29-ê Novembara sala 1943-an de dawa gotubêjê ji seroke hereketê Mistefa Barzanî bikin.

Di 15-ê çirîya paş sala 1945 (15.01.1945) - an de encumena Azadiyê hat pekanîn. Desthilatdariya Îraqe li derfeteke digeriyan ku hêzên xwe xurd û berfireh bikin û bi derbeyeke yekcarî şoreşa Barzanî tekbişkine, lê Kurdan ji baweriya xwe bi desthilatdariya Ereban

pêşket, dewleta Brîtanya dîsan bi piştgirîkirina ji dewleta Îraqe, careke din qedera siyasiya Kurdên Başûrê Kurdistanê guherand. Lê îdî navê Mistefa Barzanî mîna xebatkar û serokekî qehreman li her dera Kurdistanê bi camêrî belav bubu.

Barzanî û Komara Demokratîka Kurdistan (Mihabad 1946):

Piştî şerê bi navê Meydanê Morîkê dewleta Îraqe bi hevkarîya hêza esmanîya Brîtanya ku jib o berjewendiyên xwe yên aborî hemu yasa û qanûnên mirovanetiye binpê dikirin, karê Barzanîyan tuşî sikeştê bikin û newekhevîya hêzen her du alîyan, Şêx Ehmed û Mistefa Barzanî neçarkirin ku bi biryarek nu di 11-ê Oktobera sala 1945-an (11.10.1945) de ji rîya Keleşin ya nezîkî bajarê Sînoyê bi armanca hevkarîya komara Demokratîka Kurdistan bi hejmarek mezin xwe bigîhînin Rojhêlata Kurdistanê û malbatên Barzanîyan li heremên Mirgewer, Tirgewer, Sîno,

serokatîya her sê efsêrên başurê Kurdistanê **B e k i r E b d u l k e r î m, M i s t e f a X o ş n a v, M î r h a c û R e i s İ z z e t** di bin berpirsiyarîya wî de bun. **Damezirandina Partî Demokratî Kurdistanî Îraq, T e k ç u n a K o m a r a K u r d i s t a n û Meşa dîrokî ber bi Sovyêtistanê:**

Salakê piştî damezrandina Partî Demokratî Kurdistan (piştî Partî Demokratî Kurdistan Îran) piştî şewra ku bi Pêşewaya Şehîd **Q a z î M i h e m m e d** û karbidestên komara dêmokratîka Kurdistanê re hatkirin, di 16-ê Augusta sala 1946-an (16.08.1946) de Partî Demokratî Kurdistanî Îraq ji di




hêzên Barzanî û artêşa Îranê û caşên ku hevkarîya dewleta Îranê dikirin, şerê Nêrgî an ji Berêzer (li Mirgewer) çêbu ku Mistefa Barzanî bi xwe ji di vî

kevnare jîyana bav û kalên mene, lê li ser vê axa xwe em mehkuî, mirin û revê ne û dagirkerên Kurdistanê nahêlin em li ser axa xwe di rihetiye de bijîn. Guneha me tenê Kurdayetî ye, hişyar bin û eme biser bikevin, cimkî em ji xwe re dixebitin...! (Mistefa Cihangîr Şatî yek ji wan 502 kesan bu ku bi serok Barzanî va çubu Sovyêtistanê).

Hereketa Barzanî û şervanên wî ber bi sînore Îran û Yekitîya Sovyêtê didome û ew ber bi heremê Maku dimeşin. Di 9-ê heya 11-ê Gulana sala 1947-an de şerên mezin û berfireh di deşta Makuyê û çiyayên derdora wê de sê roj û sê şevan bi giranî di navbera her du alîyan de berdewam bun û di vî şerê dijwar de herçend artêşa Îranê bi hemu top û tank û balefirên xwe demek dirêj bu ku amadekariyên xwe kiribun, di her sê rojan de bi giranî şikestê xwarin û piştî ku bi sedan kuştî li pey xwe hiştin (yanî biqasî 271 kesan) bi dehan kes jî serbaz û fermandarên artêşa şahensahî ji bi dîl ketin destê hêzên Barzanîyan.

kurd Gêneral Mistefa Barzanî



nedihanîn. Bi vî awayî zemineya serekî din di navbera herdu alîyan de hat duristkirin. Gotubêja di navbera herdu alîyan de negêhîst tu encamekê û bi sere 25-ê Augusta 1945-an (25.08.1945) hevdiîtinên du alî bi dawî hatin.

Kurdan careke din di 5-ê çirîya peş sala 1945-an de (05.09.1945) di şere bi nava Meydanê Morîkê de hemasêyek dîrokî afirandin. Di vî şerê giran de artêşa Îraqe bi ji destdayîna 480 kuştî û 80 dîlan ji esker û fermandarên xwe carekê din bi vî heqîqetê hasiyan ku nikare bi tenê li hemberî şervanên kurd li berxwe bide. Ji ber ku di şerê navbirî de kurdan tenê 5 kuştî û 7 birîndar hebûn û nav û bangê berxwedana kurdan li her çar perçên Kurdistanê gerîya. Êdî kurden hemu Kurdistanê mezin, Başurê Kurdistanê ji xwe re kirin Keîbeya gêhîştina xwezî, hesret û cîbicîkirine daxwazên xwe yên netewî. Di wan salan de Mistefa Barzanî herçend hê di jîyane de bu jî Kurdên hemu dinyayê re bibu lîderekî efsaneyî.

Dema ku şoreşa Kurdan

Negedî û Mihabad hatin bi cîh war kirin.

Di çaxê desthilatdariya Komara Demokratîka Kurdistanê de hêzên Barzanî di parastina dewleta Kurdî de bi hemu rengan hevkarî dikirin û di çaxê komarê de bi du şerên Qarava li herêma Seqiz û şerê Milqerenî xisarek mezin li hêzên Îranê dan. Di şerê Qarava da heştê (80) serbaz û efsêrên artêşa şahensahîya Îrane hatin kuştin û 120 kes jî bi dîl hatin girtin. Di vî şerî de ji ber ku hêza Kurdan heta yek kuştî jî nedabun, tirs û wehşetek mezin ket nava artêşa Îranê.

Li ser rolê Barzanîyan di çaxê Komara Demokratîka Kurdistanê de gelek pirtuk û gotar hatine nivîsandin, lê ji wan dokumênt û nivîsên ku ji çaxê komarê mane, xuya dibe ku hêza Barzanîyan rolekî mezin di parastina dewleta Kurdan de listiye. Li ser vî esasî ji sê mehan piştî ragehandin û ilankirina Komara Kurdistan, Mistefa Barzanî bu Gêneral Barzanî û mîna serleşker û berpirsiyarekî hêza artêşê û sê tîpan bi

bin serokatîya Gêneral Mistefa Barzanî de ji bo bizava Kurdên Başurê Kurdistanê hat damezrandin. Piştî ku di dawîya sala 1947-an de komara Dêmokratîka Kurdistan têkçu, Mistefa Barzanî bi hişyarbunek zêde xebitî ku li hemberî dewleta Îrane berxwedanê bike û bê zerer û zîyan ber bi sinorên Kurdistanê Başur û Bakur hereket bike.

Di 31-ê Adara sala 1947-an de dema ku Mistefa Barzanî û şervanên wî pêhesiyank û Pêşewa Qazî Mihemed hat îdamkirin, xemgîni û bêdengîyek mezin ket nava wan.

Di 15-ê nîsana sala 1945-an de hemu malbatên Barzanîyan bi serokatîya Şêx Ehmedê Barzanî vegevin. Başurê Kurdistanê û xwe teslîmî berpirsiyarên dewleta Îraqe kirin. Mistefa Barzanî jî meşa xwe ya dîrokî di 6-ê gulana sala 1947-an de ber bi Yekitîya Sovyêtê, da destpê kirin. Lê meşa wan ya xwe va ji Mihabadê derketin û di yekemîn hefteya meha Adara sala 1947-an de serê Nalosê di navbera her du alîyan de anku hêzên Kurd û Îraniyande qewmi. Ji wê û pêda heya dawîya Adara sala 1947-an şerên Gucar (gundeki herêma Mirgever), enîya Sîno û Negedê, şerê Qarnê li herema Xanê û şerên Ewrîsî û Helec li herema Mirgever ku di tevaya şeran de hêzên Îranî bi berxwedaneken mezina hêzên Barzanî re ru bi ru mabun, di navbera her du alîyan de qewmin.

(Despêk hejmara buhurî)

Di 3-ê Nîsana sala 1947-an de (03. 04.1947) di navbera

şerî de bi sivikî birîndar bu. Ji ber şertên nebaşên hewayê (etmosfer), destpêka biharê serok Barzanî û şervanên wî di 19-ê nîsana 1947-an de neçar man ku vegevin nava axa başurê Kurdistanê. Lê zexta dewleta Îraqe û hêsiyabûna Şêx Ehmedê Barzanî û malbatên Barzanîyan, Melle Mistefa neçar kirin ku bi hêzek taybetî ku ji 502 pêşmergeyên herî mêrxas pêkhatibu di 25-e Nîsan sala 1947-an (25. 04. 1947an) xwe bigêhîne gundê Bayê li bakure Kurdistanê.


Lê artêşa dewleta Tirkîyê jî li hemberî hatina wan kete nava tevgerê û ew neçar man 2 roj piştra anku di 27-ê nîsana sala 1947-an de xwe bigêhînin gundê Cermê (an ji Cermî) û Bedkarê li

Di 18-e hezîrana sala 1947-an (18.06.1947) de Mistefa Barzanî piştî 51 rojan meşa xwe ya dijwar, şervanê herî dawiyê ji 502 servanên hêza xwe bu ku ji rubarê cema Erezê derbasî nava axa Sovyêtistanê bu.

Jîyana li Sovyêtistanê û siyaseta Baqîrov li hemberî Barzanîyan:

Di 29-ê îlona sala 1947-an de Gêneral Mistefa Barzanî û cend kesên derdora wî bi destura dewleta Sovyêtistanê pisti 40 rojan ji bajarê Nexçewane ber bi Baku paytextê komara Azerbaycanê hatin veguhastin.

Di 19-ê çilayê paş sala 1948-an (18.01. 1948) dê di konfiransa



rojhilatê Kurdistanê ku dikevin jêriya çiyayê Şehîdan. Li wê derê li şerê çiyayê Xehîdan Mistefa Barzanî bi dengê xemgîn û bihêz wiha got:

Gelî pêşmergeyan!! Binêhirin, ji şerê vî çiyayî em golla Wanê û Urmîyê her duyan jî dibînin, her du jî cîhwarê herî

giştîya ku ji aliyê Yekitîya Sovyêtê ve ji bo karê Kurdayetî yê penaberên başur û rojhilatê Kurdistanê hatibu lidarxistin, Mistefa Barzanî wek berpirsiyare giştîyê ve xebata hevpara Kurdên her du parrên Kurdistanê, hat hilbijartin.

Dûmahî rûpêl. 10

Jîyan û bi serhata azadîkarê gelê kurd Gêneral Mistefa Barzanî

Despek 9

Baqîrov (Serokomarê wê demê yê komara Azerbaycanê) ji destpêka hatina hêzên Barzanîyan bi helwestek şovênistî dan û standin bi wan re dikirin. Xuyabu ku ew ji di bin tesîra desthilatdarên komara Tirkîyê de mabu ku hebuna netewa kurd înkâr dikin û Kurdistanê bakur di wan salan de di bin sîya esmanekî reş û bi goman de mabu. Bona hebuna Kurdên komara Azerbaycanê jî ku bi hejmara xwe ji kurdên komara Ermenîstanê zêdetir jî bun, ji aliyê desthilatdarên komara Azerbaycanê ve dihat înkâr kirin.

Li ser helwesta nîşparêziya Baqîrov di 29-ê Tebaxê 1948-an de Barzanî û hevalên wî jî bajarê Baku ber bi Taşkend (paytextê komara Uzbêkîstanê) hatin veguhastin û li nêzî wî bajarî hatin bi cîh war kirin.

Di 13-e Adara 1949-an de bi pîlan û komployên Baqîrov û bi destura berpirsyarên para parastina Yekîtiya Sovyetîstanê M. Barzanî ji hevalên wî cuda kirin û li herêma derya Ûral bi awayekî desteser (dest bi ser) û di bin çavderîya tund û tûj de, demeke dirêj jîyana xwe derbas kir. Lê karbidestên Sovyetîstanê di 9-ê îlona sala 1951an de

û çend caran jî wan bi hev re hevdîtin pekanîn. Di çaxê desthilatdariya Xuruşov de rewşa sîyasi û jîyana Barzanî û hevalên wî hinekî baştir bibu.

Desthilatdariya Ebdulkerîm Qasim, vegera serok Barzanî bo Îraqê û Beesî:

Piştî ku di 15-ê tîrmehê sala 1958-an de komek ji efserên Îraqî bi serokatîya Ebdulkerîm Qasim desthilatdariya xanedana paşayên Haşimî û Nurfî Seîd bi zerbeyek eskerî jî holê rakirin, di 6-e çiriya pêş sala 1958-an de Mistefa Barzanî piştî 11 sal û nîvan derbiderî û jîyana durî Kurdistanê, li ser vexwesdina Ebdulkerîm Qasim vegeherî Îraqê û li Bexdayê bi cî û war bun. Pêşwazîya ku di çaxê vegera serok Barzanî de ji aliyê kurd û ereban ve jî hat kirin, pir germ û buyerek dîrokî bu. Mistefa Barzanî pir xebitî ku xwe bi şert û mercên rewşa sîyasiya Ebdulkerîm Qasim re biguncîne û heta hinek gotinên wî hebun ku gele kurd hez nedikir û bi başî nedidîtîn ku serokekî mîna Barzanî ji Qasim re beje:

“Ez xwe bi serbazekî we dizanim “

Lê Barzanî bi van gotinan dixwest xurtura efserekî xwedî desthilat, têr bike û gelê Kurd û

Melle Mistefa Barzanî bi yekcarî ji Bexdayê vegeherî Barzanî û mijulî kar û bar destpêka şoreşek din ya li dijî dewleta Îraqê bu.

Di hemu hevpeyvînên ku gêneral M. Barzanî bi rojnamevanên biyanî re pêk anîne, ew hertim li ser biratîya gelan û jiyaneke tijî aşî bê saz kirin.

Barzanî di hevpeyvîneke xwe de dibêje:

“Em aşîyê dixwazin û bila şer bi dawî be ku kurd û ereb bi awayekî birayane û di nava aşîyê de bi hev re bijîn...! (Ji hevpeyvîneke têlêvîzyonî ku rojnamevanekî Înglîzî pere çêkirîye).

Di 11-ê îlona sala 1961-an de Mistefa Barzanîyê nemir soresa xwe ya ku 14 salan berdewam bu li dijî rêjîma Ebdulkerîm Qasim û Beesîyên ku piştî wî hatin, dadestpêkirin. Mezin bûna Mistefa Barzanî di vê rastîyê de yê ku wî karî bi xebat û çalakîyên xwe ji serokatîya hoz û eşîretekê, sal bi sal ber bi pêşve bimeşe û di nava dîroka xebata bi şan û şerefa netewa Kurd de weke serokê neteweke bê hezkirin. Di wan salan de Mistefa Barzanî wek nunerê pîrgîreka millîya Kurd li hemu cîhanê dihat nasandin. Ji bona wê jî başurê Kurdistanê bibû qada hevdîtina rojnamevan û sîyasetvanên biyanî bi serokê Kurd Mistefa Barzanî re.

Di 8-ê Sibata sala 1963-an (08. 02. 1963) de rêjîma Ebdulkerîm Qasim bi aliyê Beesîyan ve hatibu lidarxistin, tekçu û Ebdulkerîm Qasim hat kuştin. Barzanî jî bo ku di wê dema dijwar de azadîxwazên kurd û ereb bi destê Beesîyan neyên kuştin, derîye Kurdistan û heremên azadkirî ku di bin desthilatdariya partiya wî de bun, ji wan re vekirî hîşt û bi vî awayî gelek kesan xwe ji destê Beesîyan rizgarkir. Di wan rojên hessas de ku Bexda bibu qada tolhildana Beesî û alîgirên rêjîma Ebdulkerîm Qasim, ev sîyaset, durdîtina û mîrxasîya Mistefa Barzanî carek din hizir û ramanên mirovhezîya wî jî herkesî re dan ispat kirin.

Piştî ku ji salên 1963-an heya Sibata sala 1968-an desthilatdariya Îraqê di navbera Ebdulselam Arîf û Beisîyên de dest bi dest dibu, wan piştî ku hemu dijberên xwe serkut kirin, vî carê berê xwe dan Kurdistanê û heya Adara sala 1970-an şerrên dijwar di navbera herdu alîyan de qewmîn. Piştî xebata salên giran di 11-ê Adara sala 1970-ê de li pey gotubêjên dur û dirêj di çarçoveya desthilatdariya Îraqê de otonomî



ji Kurdên Kurdistanê re hat diyarkirin. Xuyabu ku Beesî di vî biryar û lihevhatinê semîmî nebun û li benda derfeteke bun ku kar û barê xwe yê desthilatdariyê rêk û pêk bikin û piştê dîsan bi Kurdan re bikevin nava şer û hereketa Kurdistanê bi yek carî bifetisînin.

Ev sirra wan bi kiryareke hovane zu ji Kurdan re eşkera bu. Yanî dema ku di 29-ê Îlona sala 1971 an (29. 09. 1971) de îstîxbarata Îraqê bi şandina çend kesên di kincên meletîyê de xwest ku rêberê şoreşê Mistefa Barzanî bikuje û ew di vî karê xwe de bi ser neketin, careke din şerên dijwar di navbera herdu alîyan de dest pê kirin. Vê carê dewleta Îraqê xebitî ku bi hevkarîya hêzek sêyemîn soresa Kurdan tuşî şikeste bike. Şer di Adara 1974-an de bi germî li hemu heremên başurê Kurdistanê dest pê kiribu. Di Adara sala 1974an de dewleta Beesîyên Îraqê qanuna xwe ya otonomîyê îlam kirin. Lê Mistefa Barzanî jî ber mesela Kerkuk, Xaneqîn û Musilê qanuna otonomîya ku dewletê îlam kiribu, nepejirand û ew otonomîya Beesîyan otonomîyek leyîskî bi nav kir. Ji bona wê jî di Çiriya pêş sala 1974-an de bi qasi 17 mehan conta Beesîyan bi hemu şeweyên hovane, hêrişî ser gund û bajarên Kurdistanê kirin. Bi vî rengî Beesîyan mirin, reşerojî û derbiderî li hemu Kurdistanê direşandin. Wê demê jî cîhan li hemberî van kiryarên Beesîyan kerr û bêdeng bu û xaça sora (Heyva Sor) cîhanî jî bi çî şeweyan hevkarîya kurdan nekirin, ji ber ku ew ji di bin tesîra dewleta Îraqê da mabun û ev jî berêvajî zagonên vî rêxistinê cîhanî bu. Di nasandina pîrgîreka Kurd de şoreş û xebata Barzanî rolekî bercav list.

Peymana Elcezayer, rewşa doza şoreşa Eylulê û Wefata Serok Barzanî:

Di 6-ê adara sala 1975an de Îraq û Îran bi navbeynkarîya

serokomarê Elcezayîrê (Hewari Bu mîdyên) û girêdana peymana Elcezayîr lihev hatin. Mihemed Riza Şahê Pehlewî ku ji aliyê Rojava û Amêrika ve wek jandarme Rojhilata Navîn dihat hesibandin, mezintirin xiyana dîrokî li Kurdan kir. Piştî wê bi sedhezaran Kurd ji başurê Kurdistanê mişextî Rojhilatê Kurdistanê bun ku li seranserê Îranê wek penaber ji Kurdistanê hatin durxistin. Durutîya şahê Îranê ku xwe warsê tac û textê padişahiya hemu Arîyan dihesî band, ji dîrokê re eşkera bu. Wî bi vî peymana bi Beesîyan re bi cîhana sîyasetê da selmandin ku bizava nemir Barzanî bandorekê mezin li ser Kurdên Rojhilatê Kurdistanê jî hiştîye û ev bizav ji bo desthilatdariya wî ya paşerojê li Îranê jî metirsyek mezin bu.

Mistefa Barzanî piştî ku li bajarê Kereçe hat bi cîh kirin, di hemên salê de çu Amêrika û di 1-ê Adara sala 1979-an dema ku gelê kurd piştî tekçuyîna rêjîma sîtemkara 2500 salîya Şahensahî li Îranê li bendê bun ku Mistefa Barzanî vegere Kurdistanê û şoreşek nu li dijî dewleta Îraqê bide dest pê kirin, bi nexweşiya kansêrê li nexweşxaneyeye Amêrikayê wefat kir.

Di roja 5-ê Adara sala 1979-an de termê Mistefa Barzanî bi merasîmeke li bajarê Sino ku bi sedhezaran kes têde beşdar bubun, hat veşartin.

Lê piştî mirinê jî termê Mistefa Barzanî dîsan bu armanca komployên dewletên dagirker ku dixwestin Kurdan bi destê Kurdan bidin kuştin. Mihaciret û derbiderî li ser axa Kurdistanê heta di çaxê mirinê de ji dev ji Mistefa Barzanî bernedida.

Di 6-ê çiriya pêş sala 1993-an termê serokê Kurd Mistefa Barzanî û kurê wî nemir Îdrîs Barzanî jî gundê Helecê yê di herema Mîrgewer de vegehandin cîh warê bav û kalên wî herema Barzan. Mistefa Barzanî di dîroka sîyasiya gelê Kurd de buye nîrxekî gelemperî û wek lîdêr û serokekî doza bi şan û şerefa Kurdistanê hê jî di dilê gelê xwe da dijî.

Amadekar:
Tahir Silêman



careke din Mistefa Barzanî vegehandin Taşkendê.

Di 5-ê Adara sala 1953-an de Josêf Stalîn mir û Xuruşov wek sekreterê giştî û serkarê Yekîtiya Sovyêtîstanê ji aliyê Partîya Komunîst ve hat hilbijartin. Li gor telîmata Xuruşov, Barzanî li paytexta Sovyêtîstanê (Moskovayê) hat bi cîhwar kirin

ereb di nava aşîyê de bi hev re bijîn. Di destpêkê de Ebdulkerîm Qasim wusa da diyarkirin ku Îraq welatê kurd û erebaye û gel li benda rojên xweş bu ku du netewe bikaribin di aşî û wekhevîyê de bi hev re bijîn. Lê aliyê Kurd û Ebdulkerîm Qasim li ser pîrgîreka Kurd li hev nehatin û di Adara 1961-an de

Kurdistan, di sala 1639-an de encama Peymana Qesrî Şîrinê di navbeyna Împaratoriya Osmanî û Fars de bû du parçe û ket bin bandora herdu Împaratoriyan dagirker.

Kurdistan, di sala 1639-an de encama Peymana Qesrî Şîrinê di navbeyna Împaratoriya Osmanî û Fars de bû du parçe û ket bin bandora herdu Împaratoriyan dagirker. Kurdistan, hezar mixabin bi ew halê xwe jî nema, piştî Şerê Cihanê yê 1-emîn û bi taybetî jî piştî ku Împaratoriya Osmanî hat rûxandin û Kemalîst desthilatdarî ji Osmanîyan wergirtin; dewleta unîter û milî ya tirk ava kirin, di sala 1923-an de encama Peymana Lozanê jî bû çar parçe. Dewleta Tirk, Îranê, Iraqê û Suriyeyê li çar parçeyên Kurdistanê bûn desthilatdar û metîngehkar. Kurdistan jî bû welatekî kolonî ya navneteweyî li Rojhilata Navîn.

Miletê Kurd û serokên Miletê Kurd, ew statuya li Kurdistanê û xesipkirina mafên neteweyî, nepejirandin û her dem li hemberî vê statuya kolonî û kolonyalîst şer kirin û serhildan. Ev serhildana him di dema Împaratoriya Osmanî û Farsî de, hem jî di dema çar parçebûna Kurdistanê de pêk hatin.

Gelek aşkere ye, ku miletê kurd di sed sala, ku ji bona serxwebûn û azadiya xwe li ber xwe dide û têkoşîna xwe dimeşîne. Di dema Împaratoriya Osmanî de serhildana Şêx Ebdilkadir Nehrî û Mîr Bedîrxan Beg gelek girîng in. Piştî Peymana Lozanê jî li hemû parçeyên Kurdistanê gelek serhildanên milî, ji bona ku dewleta kurd ya serbixwe ava bibe û miletê Kurd azad bibe, pêk hatin. Ew serhildanan li Iraqê di bin serokatiya Şêx Mehmed Berzencî de bi avabûna Kurdistanê û li Îranê di bin serokatiya Qazî Mihemed de di demeke kurt de be jî, bi Komara Kurdistanê ya Mehabadê encam girt.

Lê pişt re him Kurdistana serbixwe ya melîkî li Başurê Kurdistanê, him Komara Kurdistanê ya Mehabadê û him jî hemû serhildanên di dema Osmanî û Farisan de, him jî serhildanên miletê kurd yên di dema dewletê milî ya erebî û tirk û îranî de bi zor û şideta dewletê hatin temirandin.

Serhildan û Şoreşa Îlonê, di navîna sedsala 20-an de, di 11-ê Îlona 1961-an de pêk hat. Ev serhildan û şoreşa di bin serokatiya Partiya Demokrat ya Kurdistan a Iraqê û Mele Mistefa Barzanî de pêk hat.

Şoreşa Îlonê, 9 salan domand û gihêşt encamê. Di encamê de li Başurê Kurdistanê, "Hukmî Zatî" yanî "Otonomiya Kurdistanê" ava bû.

Qepasîteya "Otonomiya Kurdistanê" gelek fireh û kûr bû. Ez dikarim bibêjim ku Otonomiya Kurdistanê di qepasîteya Dewleta Federe, heta di qepasîteya dewleta konfederal de bû.

Serhildan û Şoreşa Îlonê, bi gelek taybetiyên xwe jî serhildanê din yên Kurdistanê cihê ye. Lê bi taybetiyên xwe dişibe Komara Kurdistanê ya Mehabadê û Dewleta Melîkî ya Başurê Kurdistanê, ku di bin serokatiya Şêx Mehmed de ava bibû.

Ez nûha dixwazim li ser taybetiyên Şoreşa Îlonê; ferqa taybetiyên Şoreşa Îlonê û serhildanên din yên Kurdistanê rawestim.

Li pişt Şoreşa Îlonê raste rast dîrokek û ceribandinek xurt heye...

Serhildanên li derveyî Serhildan û Şoreşa Îlonê raste rast xwediyê dîrokek nînin. Li Hemû serhildanên milî, xweser derketine holê û pişt re jî şikest xwarine û tîk çûne.


Wek tê zanîn li Başurê Kurdistanê û li Iraqê di sala 1919-an de encama şoreşek

mezin Dewleta Kurdistanê di bin serokatiya Şêx Mehmed Berzencî de ava bû. Serok û mezinên Barzanîyan ji dewleta kurd û Şêx Mehmed Berzencî re bûn piştgir. Vê dewletê heta sala 1932-an dom kir. Barzanîyan jî di vê dewletê de bûn xwediyê ceribandinek gelek mezin.

Dema ku Şoreşa Îlonê dest pê kir, Mele Mistefa Barzanî û hemû serokatiya Şoreşa Îlonê xwe miradajotê dewleta kurd dizanîn û Şêx Mehmed Berzencî jî, serokê milî dipejirandin.

Mele Mistefa Barzanî, xwe temsîlkarê Şêx Ebdulsalam Barzanî jî dizanî. Şêx Ebdulsalam Barzanî jî, di destpêka sedsala 20-an de li hemberî Împaratoriya Osmanî serhildabû û reforwazekî mezin

Taybetiyên Şoreşa Îlonê û Barzanî: Serokê Şorêşê...



bû û li Kurdistanê di gelek qedan de reform pêk anîbûn.

Şêx Ebdulsalam Barzanî, bi Komeleya Tertakkî û Tealî ya Kurd, bi Komelaya Hêvî, bi Komeleya Serxwebûna Kurdistanê, bi Şêx Mehmed Hefîdî, bi Şêx Ebdilkadir Nehrî û bi axayê Şikakê Simko re jî xwediyê pêwendiyê bû.

Mele Mistefa Barzanî dema ku 3-ê saliyê di serhildana Barzanîyan de dîl dikeve destê Osmanîyan û li Musulê bi dayika xwe re hepis dimîne.

Şêx Ebdulsalam, di sala 14. 12. 1914/15-an de ji aliyê Osmanîyan de dîl dikeve û tê îdam kirin. Îdama Şêx Ebdulsalam li ber çavên Mele Mistefa pêk tê. Mele Mistefa wê demê zarok e û di îdama Şêx Ebdulsalam de biryar dide ku tu wext dê bi destê dijminên miletê kurd nayê girtin û ji dijminên miletê kurd re teslîm nabe.

Piştî Şêx Ebdulsalam Barzanî, ji tevgera kurd re birayê wî yê mezin yê Mele Şêx Ehmed ji tevgerê re serokatiyê dike û reformên Şêx Ebdulsalam didomîne. Lê Şêx Ehmed di heman dem de serokatiya Şêx Ebdilkadirê Nehrî dipejirîne.

Mele Mistefa Barzanî jî, bi Şêx Ebdilkadirê Nehrî û bi Şêx Seîdê Pîranî re danûstandin dike. Barzanîyan, ji serhildana di sala 1925-an de di bin serokatiya Xalid Begê Cibrî û Şêx Seîd Efendiyê Pîranî de li Bakurê Kurdistanê pêk tê re piştgirî dikin.

Barzanîyan, li hemberî Osmanî û Dewleta Iraqê her dem serhildan. Barzanîyan piştî Şêx Ebdulsalam Barzanî sê caran serî hildidin. Ev serhildanan di sala 1932, 1943, 1945-an de pêk tên. Bi van serhildanan Mele Mistefa Barzanî dibe xwediyê ceribandinek mezin.

Serhildana dawî beriya ku Komara Kurdistanê ya Mehabadê ava bibe, pêk tê. Barzanî û hevalên xwe piştî serhildana 1945-an a ji Başurê Kurdistanê derbasî Rojavayê Kurdistanê dibin. Dema ku Barzanî û hevalên xwe derbasî Îranê/Rojavayê Kurdistanê dibin, Şerê Cihanî ya 2-emîn qediya bû û Îran ji aliyê dewletên müttefik ve hatibû îşgal kirin. Li dinyayê eniya demokrasiyê xurt dibû û bayê demokrasiyê li hemû dinyayê diherikî. Ji bona Rojavayê Kurdistanê derfet çêbibû ku Komara Kurdistanê bê ava kirin û encama şertên taybet yê dinayayê û Îranê, Komara Kurdistanê ya Mehabadê di bin serokatiya Partiya Demokrat a Kurdistanê ya Îranê û Qazî Mihemed de

komarî ava bû. Rejîma komarî ew qedexeyên li ser zimanê kurd, perwerdiya zimanê kurd, li ser neteweya kurd û Kurdistanê ji holê rakir. Kurdistan, bi navê xwe hat bang kirin. Di rejîma melîkî de Kurdistan, bi "Bakurê Iraqê" dihat binav kirin.

Rejîma Iraqê hikumeteke nû ava dikin. Di hikumetê de du wezîrên kurd jî cîh digirin. Ya girîngtir jî, rejîma komarî biryar dide ku makezagonek nû dipejirîne. Encama xebatek kurt, makezagonek dipejirîne.

Di makezagonê hat tespît kirin û pejirandin ku Iraq ji du miletan pêk hatiye û ew miletan kurd û ereb in. Li Iraqê du zimanê fermî hene, ew zimanan jî zimanê

ava bû.

Barzanî ev ceribandina dewletbûna Kurdistanê ji nêzik de dişopîne û raste rast dibe berpirsiyarê Komara Kurdistanê ya Mehabadê. Ew dibe serokerkanê Kurdistanê. Barzanî, rêvebirana dewletek serbixwe re dibe berpirsiyar. Ji vir ceribandin digre û çandek nû qezenç dike.

Encama vê ceribandinê, biryara avakirina Partiya Demokrat a Kurdistana Iraqê dide. Loma jî bi berpirsiyarên Partiya Şorêşê û Partiya Rizgarî ya Kurdistana Iraqê re danûstandin dike û ew partiyan xwe fesih dikin, modela PDK a Îranê dipejirînin û Partiya Demokrat ya Iraqê di 14-ê Tebaxa 1946-an de ava dibe.

Mele Mistefa Barzanî jî dibe serokê giştî yê partiyê.

Mele Mistefa Barzanî, li Komara Kurdistanê ya Mehabadê bê qeyid şert serokatiya Qazî Mihemed dipejirîne.

Piştî ku Komara Kurdistanê ya Mehabadê hat rûxandin, Mele Mistefa Barzanî û hevalên xwe di sala 1946-an de encama gelek zehmetan derbasî Yekîtiya Sovyetê dibin.

Ew, li Yekîtiya Sovyetê, 12 salan dimînin û di sala 1958-an de encama guhertina rejîma Iraqê vedigerin Iraqê. Li Sovyetê rejîma sosyalist nas kirin û bûyerên li dinyayê diqewimin ji nêzik de dişopînin.

Li Yekîtiya Sovyetan jî ceribandinên xwe zêde dikin; di derbarê sistemên siyasî û civakî de zanyare dibin.

Şoreşa Îlonê şoreşek plankirî û programkirî ye...

Serhildanên Kurdistanê bi giştî bê plan û program, spontane dest pê kiribûn. Şoreşa Îlonê encama plan û programek xurt dest pê dike û encam digre.

Partiya Demokrat a Kurdistanê Iraqê piştî ku di sala 1946-an de ava dibe, li hemberî rejîma melîkî û faşîst, li hemberî emperyalîzma Îngilizî şerekî bi plan û bi program dimeşîne. Encama xebata Partiya Demokrat a Kurdistanê, welatparêz û demokratên Iraqê, rejîma melîkî li Iraqê hat rûxandin. Ebdulkarîm Qasim û Ebdulsalam Arif rejîm bi leşkerî xistin destê xwe.

Dema ku li Iraqê di 14-ê Tirmeh a 1958-an de darbeya leşkerî pêk hat û rejîma melîkî hat guhertin, Şêx Ehmed Barzanî, gelek berpirsiyarên partiyê û welatparêzên kurd di girtîgehan de bûn. Piştî ku darbeya 1958-an pêk hat ku wek şoreş dihat bi nav kirin, Şêx Ehmed Berzencî û welatparêzên kurd yên hepis hatin azad kirin.

Li Iraqê li ciyê rejîma melîkî, rejîma

kurdî û erebî ye.

Mele Mistefa Barzanî û hevalên wî li derve û li Yekîtiya Sovyetan, Partiya Demokrat a Kurdistana Iraqê li hundir bi xurtî piştgiriya rejîma nû dikin. Mele Mistefa Barzanî û hevalên wî ji bona ku vegehin Iraqê, hewildidin Di vê pîrsê de gelek dewlet û Yekîtiya Sovyetê dibin navbençî. Di encamê de şertên vegehe pêk tên. Mele Mistefa Barzanî û hevalên wî, pêşî diçin Romanyayê/Bukreşê, pişt re diçin Çekoslovakayê/Pragê; di dawî de jî diçin Misirê, bi Ebdulnasîr re hevdiştin dikin û piştgiriya wî qezenç dikin, vedigerin Iraqê.

Dema ku Mele Mistefa Barzanî û hevalên wî tîna Iraqê û Kurdistanê, bi zanyarî, bi armanek vekirî û bi plan ji rejîma komarî re piştgirî dikin. Partiya Demokrat a Kurdistan a Iraqê legalîze dibe, kongreya wê pêk tê û partî xwe jinûve reorganîze dike.

Mele Mistefa Barzanî û partiya wî ji bona ku sîstema nû ya niv-federal û demokrat ava bibe, bi xurtî xebat dikin. Di vê navbeyna de diçe Yekîtiya Sovyetê û bi Sovyetê re danûstandin dike, piştgiriya wan qezenç dike.

Rejîma komarî û Ebdulkarîm Qasim ji pêşketina kurdan û Barzanî gelek eciz dibe. Piştî ku wek Kemalîst xurt dibin û lingên xwe didin erdê, ew mafên ji bona kurdan hatibûn pejirandin sînor dikin. berpirsiyarên partiyê digrin û hepis dikin. Di derbarê Sekreterê Giştî yê Partiyê Îbrahîm Ehmed de lêpîrsînê dest pê dikin.

Derket holê ku rejîma komarî berbi demokrasiyê ne, ber bi faşîzmê diçe. Makezagon nexin jiyane. Mele Mistefa Barzanî û hevalên wî jî, ji bona ku xwediyê ceribandin û zanyariyek nû ne, dest ji Baxdayê berdidin û diçin li Kurdistanê bi cîh dibin. Partî jinûve sîrrî û veşartî dest bi xebatê dike.. Dema ku Mele Mistefa Barzanî û serokatiya partiyê bi giştî fahm dikin, ku rejîma komarî ya nû ya Iraqê dê bi leşkerên xwe êrişî Kurdistanê bike, ew biryar digrin ku li hemberî êrişê rawestin.

Di 11-ê Îlona 1961-an de Şoreşa Îlonê gelek bi plan û bi program dest pê dike.

Armanca Şoreşa Îlonê: Otonomî bû... Hemû serhildanên Kurdistanê, Kurdistaneke serbixwe ji xwe re kiribûn armanc. Şoreşa Îlonê, li Iraqê demokrasiyê û li Kurdistanê otonomî kiribû armanca xwe. Di vê armanca xwe de jî bi serket.

Şoreşa Îlonê dema ku otonomî diparast, wê demê jî ne li dijî dewletek serbixwe ya Kurdistanê bû.



Президент Барзани встретился с Аядом Аллави

В понедельник, президент Курдистана Масуд Барзани принял в своем офисе в Багдаде лидера коалиции аль-Иракия Аяда Аллави.

В ходе встречи они обсудили текущую политическую ситуацию в Ираке, вновь подтвердив необходимость реализации Эрбильских соглашений 2010 года и заполнения вакантных силовых постов.

Также были обсуждены последние события в некоторых арабских странах.

Сторонники РПК захватили Совет Европы



Сторонники Рабочей партии Курдистана требуют свободы своему лидеру

